## Çi ji zaroka min re gereke?

Gava zaroka we bê bexçê zarokan, jê re ev tiştên ha gerekin:

- Leystika ew jê hezdike (heger hebe)
- Şimik / pêlavên malê
- Taştê/ xwarinek biçûk ji bo paşnîvro
- Şalekî ji bo şiliyê/ saqoyê baranê/ cîzma şiliyê
- Cilên guhertinê





## Çi ji bexçê zarokan re gereke?

Bexçê zarokan van tiştana ji we dixawe:

- Jimareke telefonê, ji bo karibin **<u>di her demê de</u>** li we bigerin gava gerek bû.
- Mafê birina zarokê (kî dikare zaroka we ji bexçê zarokan bibe?)



Nûçe û înfomasîonên mayî hûnê di xeberdanê de ji karkerên bexçê zarokan, ko pisporên pedagogikê ne, wergirin.

## Bi çi awayî rojên pêşî li bexçê zarokan têne derbaskirin?

Ji bo qonaxa hînbûn û naskirina zarokê ji bexçê zarokan re, bi asanî û xweş bibuhure, em pîlaneke tekane li gora rewşa her zarokekî datînin.

Destpêkê hinek seet û gav bi gav, da zarok hîn bibe, cîh û kesên nû li bexçê zarokan nas bike.

Hebûn û amadebûna dê yan bavê yan jî keseki din, ko nêzîkî wî ye û cihê baweriya wî ye, gelekî girînge.

Gava bawerîyeke xurt û baş bi karkerên bexçê zarokan re peyda bibe, wê gavê zarok dikare bi tenê, bê dê û bav, li cem me bimîne.



In Anlehnung an die Bildungsregion Landkreis Peine

Bildungsregion Landkreis Peine

## Gereke haja min ji çi hebe?

Gave hûn zaroka xwe bînin bexçê zarokan, wê bispêrin karkera xwedîkirinê ya berpirsyara wê.

Zarok karin bêne bexçê zarokan, tenê gava nexweşîyên jêketinê û belavbûnê bi wan re nebin.

Heger zaroka we nesxweş be, ji bexçê zarokan re telefon bikin û agahdar bikin.

*Ji min re bibêje û ezê ji bîr bikim.*
*Pêş min bike û wê were bîra min.*
*Bihêle ez bi destê xwe bikim û ezê fêr bibim!*

*(Konfuzius)*











In Anlehnung an die Bildungsregion Landkreis Peine

Bildungsregion Landkreis Peine

# Kindergarten

# Zaroka min diçe Bexçê zarokan

**Çi ji zaroka min re gereke?**

**Çi ji bexçê zarokan re gereke?**

**Bi çi awayî rojên pêşî li bexçê zarokan têne derbaskirin?**

**Gereke haja min ji çi hebe?**

**Sprache: Kurdisch**

Landkreis Oldenburg

10.60d.docx